Jina duyê

Çîrok ji nivîsîna : Raîd Qasim
Werger ji erebî: Salih Yusif Sofî

Li beramberî pencerê rawestiyaye û hewayê ji der ve heldikêşît û her demê berê xwe didete zelamê xwe yê nivîstî. Dibînît jineka dî li nik wî razaye! Erê ew tiştê dibînim raste? Jineka dî li hembêza mêrê min!! Pencerê pitir vediket da ku baştir bibînît, lê dibînît destê wê li ser sîngê wî dirêj kiriye.. Wekî dîna li qîjiya didet.. Demildest mêrê wê hişyar dibît û bi lez ber bi wê ve dihêt û bizava hawîşkirina wê diket, lê ew kevtibû bin hilhijiyaneka neasayî û rewşa wê têk çûbû.

- Wê ji nav nivînên min derbêxe.

- Xweştiviya min, bawer ji min bike ji bilî te çi jinên dî li vêrê nînin.

- Ne.. Nê min bi xwe baş dît û destê wê li ser sîngê te bû, hêvî ji te dikem wê derbêxe!

Mêrê wê bizavê diket kontrolê li ser biket, paşî pîçek hawîş bû, bi lez nojdarekî bo dihînît û nojdar şirenqeka bencê bo didanît û heta spêdê dinivît û spêdê mêrê wê sertêşeka germ bo dihînît.

- Xweştiviyê min bibore, min hizir kir te jinek bi ser min înaye.

- Ez qet û qet we nakem, tu hevjîna minî, xweştiviya minî, hevala minî, tu her tiştekî di jiyana min de.

Dihêlîte bi tinê da ku bêhna xwe bidet û paşî mêrê wê qesta ser karê xwe diket, jin jî diçîte di serşoyê ve û li beramberî xudîkê radiwestît, lê jineka dî li beramberî xwe dibînît..

- Careka dî tûy?!

- Belê ez hewiya te me, ez xweştiviya wî ya bi rastame.

- Nabît!

- Eve rastî ye, li nêzîk dê te berdet û ev male hemî dê bo min bît, tu jî dê çî ye wê mala jê hatî.

- Ne, ez nahêlim tu we bikey.

Dest dihavête qafkekî û di xudîkê wer diket û pirtên şûşa dikevne ser ser û çavên wê û dikevît û ageh jixwe namînît.

Mêrê wê peywendiyê pê diket da ku ji saxlemiya wê piştrast bît, lê bersivê nadet. Zelamê wê dûdil dibît û demildest vedigerête mal, dibînît jin ya dirêj kiriye, heldigrît û li bayê bezê digehînîte nexweşxanê.

- Xweştiviyê min, min dît.

- Te kî dît?

- Jina te ya duwê.. Min di xudîkê da dît û gote min ew dê te û mala me bo xwe bibet û tu jî dê min gelek kirêt ji mal derêxî, min bizav kir wê biqutim lê xwe berze kir.

Zelamê wê piştrast dibît ku ew pêdivî nojdarekê derûniye û bi zûtirîn dem qesta kilînîkeka nojdarê derûnî diket.

- Xanimê te çî ye û ew kîj jine dirahêlîte te?

- Ew jina mêrê min e, wê divêt bibîte jina êkê û dwîmahyê ya mêrê min?

- Bêje ka ya çewaye?

- Yeka bejin dirêj û pirç zere û gelek ya ciwane.

- Erê tu hest dikey ji te baştir bît?

- Nizanim.

- Navê xwe gote te?

- Nexêr.

- Te guh li dengê wê bû.

- Belê.

- Erê heke te li cihekî dît dê niyasî?

- Çê dibît.

Nojdar hindek dermanan bo dinivîsît û mêrê wê şîret diket ku bibete seyranekê. Paşî her dû çantên xwe amade diken û diçine havîngehekê.

Li wêrê gelek jinan dibînît, bizavê diket û baş berê xwe didete hindekan belkî neyara xwe û hewiya xwe û dijmina xwe bibînît, lê paşî dermanên xwe dixwet û dinivît.

Zelamê wê li wêve li ber hewayê razaye. Jin ji xew hişyar dibît û dibînît jina duwê li nik wî ye û bo xwe diaxivin!! Baz didet û didanên xwe di sîrrikînît û bizavê diket kulmekê lê bidet, lê pê wê bi lêva melevangehê dikevît.

- Dê te kujim! Heta vêre jî radihêliye me, te çi ji me divêt? Me êk û dû divêt û sexmeratî te min nahêlît, dê here hey bîjmulte..

Xelk ji hemû rex avê lê kom dibît. Zelamê wê destê wê digirît, hawîş dibît heta di xew diçît.

- Xwedê we çi bikem heta helametê jina duwê ji nav bibem?!

Careka dî ji xew hişyar dibît û berê xwe didete kinarê dirêj, dibînît careka dî ku mêrê wê xwarinek di destî da ye û jina duwê bi rex ve ye, îna ji kerbên xwe da bi hemû dengê xwe li qîjiya da û hemû ewên li havîngehê ageh jê bû.

- Bê dehmanê xwe dûr bêxe, eve mêrê mine û eve jiyana mine bo çî tu dê wêran key?

Ji ber qîjyên wê yên bilind zelamê wê xwarinê dihavêt..

- Bawer ji min bike kes li gel min nîne, ez yê bi tinê me û min xwarin bo te înaye.

- Ne, ew ya bi rex te ve û bizavê diket te ji min bistînît û mala me kavil biket û jiyana me wêran biket, wê berde da ku bi xweşî bijîn û rojên ciwanên evîniya me bizivirineve.

Di gel van axivtinan bi dehan kes li rex û rûyên wan kom dibin û hemû wê piştrast diken ku ew yê bi tinêye û kes li gel nîne.

Jin bi awayekê histîrî digirît û mêrê wê demildest xwe digehînîtê û wê hembêz diket..

- Min tu bi tinê divêy û ji bilî te kesê dî di dilê min da nîne?

- Raste xweştiviyê min?

- Te piştrast dikem.

- Û jina duwê?

- Tinê ew sehmeke kontrol li ser te kirî û bizavkirî te wêran biket, xwe heke te dît jî wê pişt guhê xwe ve biavêje, piştrast be ku tiştê te dîtî leylaneke û çi rastî bo nîne..

Jin pîçek dadihêt û kehî dibît û wekî berê zîx û çeleng dibîteve û dest bi jiyana xwe ya siruştî diketeve, lê hêşta jina duwê li gelek cihan dibînît, nexasme li nav nivînên hevjîniyê û li ser kinarê deryayê û li Melevangehê, ew di gel kehî bûye û dûdilî li beramberî wê nîne, belkî hindek caran bizavê diket di gel biaxivît, lê ew bersiva wê nadet! Hûrik berê xwe didete hemû elemêntên leşê wê, bejna wê, rengê pirça wê, makyajê wê û bizavê diket çav li wê biket! Hindek caran dibêjîte mêrê xwe:

- Jina te ya duwê ya ciwane û dibît ji min ciwantir jî bît.

Ew jî b axivtina wê dikenît û dibêjît:

- Xweştiviya min tu rastiyekî û jina min ya duwê, ya tu bi rex min ve dibînî, tinê wehmeke û nehêle wehim rastiyê wêran biket.